

Îshaq-Aqûb



DANNY BOLANADI/19



Published by the Comic Bible Society, LLC
Copyright © 2021

Kingstone Comics maintains copyright to
this comic book as provided by United
States copyright law.

Print and digital copies of this version may
be freely distributed without penalty under
a Creative Commons license.



Sarayê 127 sal jiya û li welatê Kenanê jiyana xwe ji dest da.

Îbrahîm jî li ser wê şîneke mezin kir.



Tevî ku Xwedê soz dabû Îbrahîm ku ew û neviyên wî dê di dawiyê de welat bi dest xwe bixin, wî çû ba Hîttîyan ku li bajarê Hevronê diman.

Erê, tevî ku ez di nav we de xerib im, ez li derekî digirim ku ez miriya xwe lê veşêrim.



Destpêk 23:1-13



Efron pêşve hat...

Ezbenî, ez zevî û şikefta
tê de jî didim te. Tu dikarî
miriya xwe bibî û li wir
veşêrî.



Ez ê bihayê zeviya
te bi temamî bidim.



Îbrahîm pereyê xwe derxist û
da û vêca milk bû bi navê wî.

Ew zevî û milk parçeyê pêşî jî hêvîştana
Îbrahîm bû, ku wî jina xwe li wir veşart.



Îbrahîm jî bo mirina Sarayê, jina xwe ya delal, xemgîn bû. Wî bi wê
re soza Xwedê ya niwaze di bûyîna Ishaq de serpêhat.





Dirêjahiya rêwîtiyê ber bi welatê Îbrahîm Mezopotamya ve 450 mîl bû. Û bi bawerkirina bi rênîşan û tevdira Xwedê Êliyezer bi rê ket û çû.



Ya Xudan, Xwedayê malxweyê min Îbrahîm, ka îro serketinê bide min.



Ez ê wisa ji keçekê re bêjim: "Ji kerema xwe ji cerê xwe avelê bide min." Û heger ew ji aliye xwe bêje: "Kerem bike vexwe, ez ê deveyên te ji tîrav bikim,"

Wî çaxî ez ê bizanibim ku te qenciye ji xulamê xwe Îbrahîm re kirîş kirîye.

Ji kerema xwe...
Tu dikarî hinek av ji cerê xwe bidî min?

Destpêk 24:10-17



Ezbenî, kerem bike vexwe,
ez ê deveyên te jî têrav
bikim.

Ya Xudan û Xwedayê Îbrahîm,
te bi rastî bersivên duayên
me da.



Ka ji min re bêje, tu keça kê yî?
Gelo mala bavê te mêvnan
dihewînin ku em îşev li wir bimînin?



Ez keça Betûêlê kurê
Nahor û Mîlkayê me.



Spasî ji Xudan
re -- Xwedayê malxweyê
min Îbrahîm.

Te rêya mala merivên
malxweyê min nîşanî
min da.

Nahor birayê Îbrahîm bû, yanî bi wî
awayî Rebeqayê dotmamê îshaq bû.





Xwedê malxweyê min Îbrahîm pîroz kiriye.
Di bin destê wî de gelek pez û dewar,
zêr û ziv, deve û ker û herwiha xulam
û xadim hene.

Lê tiştêkî wî
kêm heye...



Kurê wî Îshaq ku di pirtiya
wî de hat dinê hê nezewiciye
û bi jin nebûye.

Malxweyê min min kir ez sond bixwim ku ez jînekê jî
welat û merivên wî binim. Û jî ber vê yekê min
ev rêwîtiya dîr û dirêjî kînye.



Wî got: "Wê Xudan ku ez li
hemberê meşiyam serkeftinê
bide rêwîtiya te."



"Min jî Xwedê lava kir ku yê hilbijartîyê wê bêje:
"Kerem bike vexwe, ez ê deveyên te jî têrav bikim."



Îcar, jî min re bêjin heger hûn ê jî
malxweyê min re dilsozî û dilovaniyê
bikin.

An na, jî min re bêjin divê
ez li ser kîjan rêyê bi rê
kevim û biçim.





Îcar Êliyezer bi rê ket û çû ba malxweyê
xwe Îbrahîm -- û Îshaq.



Rojekê ji rojan Îshaq ji mal derket û çû nav zeviyan ku ji xwe re kûr bifikire.



Çaxê wî serê xwe bilind kir, dît ku deveyê Êliyezer vedigere malê.

Û bi wî re keçeke heyê.



Ka li Îshaq, kurê malxweyê min Îbrahîm, binêre.



Rebeqayê serçavê xwe bi xêliyê nixamt...



...wek ku Êliyezer her tiştê ku kiribû ji Îshaq re got.



Tevdîra Xwedê ji bo Îsrail û ziniyeta Mesîh berdewam kir...

Îshaq ji Rebeqayê hezkir û di dawiyê de dilê wî gelek rehet bû.

Piştî mirina Sarayê, Îbrahîm jineke din ji xwe re anî.
Navê wê Qetûra bû û ji wê jî kurên din çêbûn.



Lê gava ku Îbrahîm hê sax bû, wî diyarî dan kurên xwe yên ji cariyên
wî bûn û wan ji xwe dûr xist da ku her tiştê xwe jî Îshaq re werin hiştin.

Êliyezer! Xweyî me Ibrahim --Ew--
Ew çû ber bi rehma Xwedê ve!



Bi tevahî, Îbrahîm 175 sal 'emir kir û kurên
wî Îshaq û Îsmail ew veşartin.



Wan ew birin şikefta Maxpêlêya da ku
bi jîna xwe Sarayê re were veşartin.



Wek ku Xwedê soz dabû Îbrahîm, Îsmail
12 kurên xwe hebûn ku bibûn serekên
'eşîran.

Ew bûn pêşîneyên gelê
'Ereban ê dema îro.

Û Xwedê Îshaq pîroz kir -- û xwe jî wî venqetand.



Ji ber ku ji bo Rebeqayê tu zarok çênedibûn, îshaq jê re lava kir û pê re wê karî bi zaro bima.



Wek ku zarok di zikê wê de hevdu def didan, Rebaqayê jî Xudan pirsî û got...

"Ev di zikê min de çi dibe?"




Di zikê te de du millet hene û wê ji bedena te du netewên cuda çêbin.

Wê yek ji yê din hêzdartir be û yê mezin ji yê biçûk re xizmetê bike.



Va ye, kurê te yê pêşî hate dinê -- Rengê wî sor e û bipirç e!

Wê navê wî Esaw¹ be.



¹ Dibe ku wateya navê wî were "yê bi pirç", lê ew herwiha bi navê Edom dihat naskirin, ku wateya wî tê "yê sor".

Û a niha birayê wî jî tê dinê -- Ew bi destê xwe bi pehniya birayê xwe digire!

Loma divê navê wî bibe Aqûb².



² 'Aqûb' tê wateya "Yê pehnigirtî" an "Hîlekar".



Esaw zilamekî çolhez
û nêcîrvanekî baş bû.

Lê Aqûb tenê bédengiyê
û rûniştina li nav konan
dixwast.



Kurê min, ez çiqas ji
wan tiştên çolê ku tu
tîni hezdikim!



Îshaq bêtir ji Esaw hezdkir, lê
Rebeqayê ji Aqûb û ruhê wî yê
nêrm hezdkir.



Ka bila ez hinek ji vê goştê sor ku
tu dikî şiv bixwim. Ez ji nêza ketim!

Ez ê wisa bikim, lê pêşî
mafê xwe yê nixurtiyê
bifiroş min.

Ez ê çî ji mafê nixurtiyê
bikim heger ez ji birçibûnê
bimirim!?



Ka ji min re
sond bixwe


Ez sond dixwim -- Ka
xwarinê bide min.



"Mafê nixurtiyê" tê wateya ku
yê vê mafê bi dest xwe de ye wê du
parên mîras biştîne û herwiha
bibe serok û kahnê malbatê.

Bi wî awayî Esaw nix û pîroziya vê mafê qet nizani û kêmt dît.

Dema ku xela li welêt rabû, Îshaq xwe rakir û çû ba Avîmelek Padişahê Filîstîyan, piştî ku Xwedê jê re xuya bû û hişiyar kir ku neçe Mîsrê.



Li vî welatê rûne û ez ê li gorî soza xwe bi bavê te Îbrahîm re hemû tişt bidim te.

Wê ziriya te bi qasî şêrên ezmanan pir bibin û bi saya wan wê hemû mîletên dinyayê bîn pîrozkin.



Û ev jina ya bi te re?



Ew xwişka min e -- û bi me re rêwîtiyê dike.

Îshaq vê yekê wekî bavê xwe Îbrahîm kir. Wî bawer nekir ku wê Xwedê hay ji wan hebe.



?!?

Ev çi ye ku te bi me kir?

Hindik mabû ku yek ji zîlamên min bi jîna te re razî û te sûc bi ser me de bîaniya.


Ev jin ji dil jîna te ye!



Ka vê emîrê li seranserê welêt belav bike -- Bila tu kes dest nede Îshaq û jîna wî, an jî wê bê kuştin.



Destpêk 26:1-11




Xwedê Îshaq li welatê Filîstîyan gelekî pîrozkir, heta ku Avîmelek ji jê xwest ku ji wê derê bar bike û here.



Lê şivanên wê herêmê bi şivanên Îshaq re li ser meselê avê û bîran pev çûn.

Di dawiyê de, Îshaq bireke din kola û li ser wê tu pevçûn çênebû. Wî navê wê kir "Rehovot," çimkî Xwedê wî derxiste firehiyê.



Careke din, Xwedê bi Îshaq re axavî û jê re got ku netirse --

--Xwedê tu dev ji Îshaq berneda û kir ku ziriyeta wî ji gelekî zêde bike.




Avîmelek nêzîkê min bû, tevî ku ew li dijî min dixebitî.



Me bi eşkereyî dît ku Xudan bi te re bû û ji ber wî me tirsîya.

Me hergav qenciye bi te kir, îcar bila em aştiyê di navbera xwe de çêkin.

Ji ber vê, bila di navbera me û te de sondek hebe.



Aştî di navbera Îshaq û cîranên wî hat pêkanîn, lê pirsgrêkeke din di nav malbata wî de dihat holê.

Esaw nexwest ku tu kes ji merivên xwe bizewice, lê wî ji xwe re du jin ji "eştrên nebawermend bir. Û ji ber vê, xemeke din ji Îshaq û Rebeqayê re çêbû.



Êdî ez pîr bûme û çavên min jî qels bûne. Ez nizanîm ez ê kengê bimirim.

Ka here jî min re xwarineke bi lezet ku ez jê hez dikim çêke û bine -- Û beriya ez bimirim, ez ê te pîroz bikim.



Binêre, min a niha bihişt ku bavê te jî Esaw xwast ku here nêçîrê û xwarineke xweş bine da ku wî pîroz bike.

Hele rabe here du bîzin bine û ez ê jî wan xwarineke bi lezet a ku bavê te jê hez dike çêkim.

Wê wextê tê jê re bibi û bereketa wî bişîni.



Lê Esaw bi pirç e û ez bê pirç im.

Heger bavê min destî bi min bide, wê li şûna bereketê naletê bi ser min de bine.

Law, tiştê ku ez jî te re dibêjim bike û bila nalet bi ser min de were.





Ka van cilên birayê xwe îshaq
ên herî baş li xwe bike – Hingê
wê bêhna te mîna wî be.



Wê bi çermê karikê mîna destên
Esaw ên bipirç were hesîn.

Îcar bi van yekan û bi xwarîna xweş a bi
lezet wê bavê te bifikire ku tu Esaw î û
hingê wê berketê bide te.



Bavo!

Belê kurê min --
tu kijan î?

Ez kurê te yê mezin im, ez Esaw im. Min
ji te re tiştê ku tu jê hez dikî anî da ku
ez bereketa te ji xwe re bişînim.

Ka bila ez destê xwe bi te bikim da ku
ez baş bizanibim heger tu bi rastî
Esaw î yan na.



Deng dengê Aqûb e,
lê dest destên Esaw in.

Bi rastî jî tu Esawê
kurê min î?

Erê,
ez im.



De ka ji min re
hinek ji gostê ku
ez jê hez dikim
bine.



Kurê min, ka
nêzikê min bibe
û min ramûse.



Oy... Va ye, bêhna kurê min
wek bêhna çolên ku Xudan
piroz kirîye.

Xwedê bike ku
dewlemendiya erdê û
xunava ezmên ên te bin.



Bila netew ji te re xulamîyê
bikin û gel serî li ber te bitewînin.

Yên ku nîfrê li te dîkin,
bila nîfr li wan be û yên ku
te piroz dîkin, bila piroz bibin.







Ez baş nizamim heger kevir dikare şûrê te hê tûj bike. Divê tu xwe ji bo xwînrijandina gelean amade bikî.

Na -- Tenê ji bo Aqûbê bereday.



Lê ew birayê te ye!

Erê, lê ne ji vir û ha da. Ew min di cara dawiyê de xapand.



Ka bilezîne, tiştên xwe berhev bike. Ez ê te bişînim ba birayê xwe Lavan.

Hinek ji min re gotin ku birayê te bi niyeta kuştina te xwe tesellî dike.



Paşê, di konê Îshaq de...

Ez ji rûyê wan jinên Hîttî yên Esaw ve ji jiyane têr bûm.

Heger Aqûb jî bi keçên vî welatî re, bi keçên Hîttî re bizewice, ez ê çawa bijîm?

Ka bila Aqûb were ba min.



Kurê min, zû rabe here Paddan-Aramê. Li wir, keçeka xalê xwe Lavan ji xwe re bîne.

Bila Xudan te pîroz bike, ziriyeta te pir bike û bila ew wî welatê ku Xwedê dabû Îbrahîm ji xwe re bikin milk.



Tu dikarî mala bavê min ji xwe re biki panegêh.

Wê birayê min Lavan ji te re bêje tê çi biki.




Îcar ew ji jinên min ên Kenanî heznakin... Dibe ku ez bikaibim bi vê yekê mafê xwe yê kurê pêşî vegerînim...



Aqûb bi ya bavê kir û ber bi Heranê ba malbata diya xwe ve çû.



Ew xwe li wir ji birayê xwe Esaw veşart û herwiha xwaşt jineke ji xwe re bibîne.



Aqûb li derekê sekinî da ku şeva xwe li wir derbas bike. Wî ji wir kevirek hilanî û danî ber serê xwe ku raze.


Esaw jineke sêyem ji xwe re bir. Ew jina keça apê xwe îsmaîl bû. Ew dibe ku ew bi vê yekê dixwaşt dê û bavê xwe razî bike.

Ez Xudan, Xwedayê
bavkalê te Îbrahîm û
Îshaq im.

Wê ziriya te wek
toza erdê zêde
bibe...

Wê hemû 'eşîrên li ser
rûyê erdê bi te û bi
ziriya te pîroz bibin....





...Û ez ê te li her
dera ku te herî
biparêzim.



Paddam Aram.

Welatê malbata Rebeqayê.

Birano -- Hûn ji ku
ve tîn?

Em ji Heranê
ve tîn.

Ma hûn Lavanê neviyê
Nahor nas dîkin?

Erê, em wî
baş nas dîkin.

Çawa ye,
baş e?

Erê baş e.
Va ye keça
wî Rahêl tê.

Ez merivê te me -- Ez kurê
xwişka bavê te me!

Ka bi min re were! Wê bavê
min bi hatina te şa bibe!

Bavo! Va ye kurê xwişka
te Rebeqayê li ba me
hatîye!





Piştî ku Rahêlê kurê xwe Ûsiv anî dinê, Aqûb çû ba xezûrê xwe.



Ka jin û zarokên min û hemû milkên min ji bide min û bihêle em vegerin mala xwe.

Ez têgihistim ku Xudan ji rûyê te ez proz kirime. Ji kerema xwe li vir bimîne -- û bêje heqê te çi ye.



Bi saya çavdêriya min malê te yê hindik zêde bû.

Lê nîha ez amade me ku ez ji bo malê xwe bixebitim.

Divê ez çi bidim te?



Tenê vi tiştî. Bihêle ez hemû mi û bizinên belek û bi deq û hemû berxên reş veqetînim.

Bila ew bibin heqê min û heger tu tiştêkî din di keriyê min de hat dîtin em ê wan behisibînin ku hatine dizîn.



Lavan û kurên xwe van heywanan ji keriyên din veqetandin û wan bi qasî sê rojan ji Aqûb dûr xistin.






Lê Aqûb tişteki din amade dikir.



Ew şaxên qeşartî danî ser cirinên avê û pez li ber wan şaxan fahl dibûn.

Lê ew tenê vê yekê ji heywanên xurt re kir.

Û ew heywanên qels ji bi yên Lavan re kir.



Bi vî awayî keriyên Aqûb pir zêde bûn.



Êdî Aqûb gelek dewlemend bû û gelek keriyên pez û dewar, xulam, xadim, deve û kerên wî çêbûn.

Wê mêrê xwişkên me hemû malê bavê me bibe.



Ez ê li ser vê mesele bixebitîm.



Bav û birayên te êdî wekî berê
bi min re tevnagerin.



Bavê we deynê min ê li wî bû deh
caran guhert, lê Xwedê nehişt ku
xesarê bide min.

Xwedê van hemû tiştên ku bi serê
min hatin dît. Xwedê dixwaze ez
vegerim welaê xwe.



Êdî tu par û mîrasa me ya li
vir neman û ser de em xerîb
tên hesabandin.

Niha her tiştê ku Xwedê ji te
re gotiye bike. Em bi te re ne.



Îcar dema ku Lavan çû miyên xwe hevring bike,
Aqûb bi jin, zarok û heywanên xwe revin.

Herwiha Rahêlê jî pûtên
malê yên bavê xwe dizîn.



Bavo, xulaman dibêjin ku berî sê rojan Aqûb li gel xwişkên me û bi hemû tişt û milkên xwe re reviyân.

Ka bilez birayên xwe û merivên me kom bike.

Divê em bi wan gelek kerîyan re bikanibin bigihîjin wî.




Hay ji xwe hebe! Ji Aqûb re ne tişteki baş û ne ji tişteki xerab bêje.



Va ye bavê we jî me dît.

Bavê min zilameki geleki serhişk e.



Te çima bi dizî reviyayî û te ez xapandim?

Te min nehişt ku ez keçên xwe û neviyên xwe ramûsim û bi te re bişînim.

Hê jî Xwedayê te bi min re axavî û ji min xwest ku ez bi te re nerm bim.

Ez tirsîyam, çimkî min got tê bi zorê keçên xwe ji min biştîni.



Te tişteki gelek ehmeqî kir.

Te hê îlahên mala min dizî!

Îcar di nav kon û tiştên min re bigere û gazina xwe rast nîşan bide.

Aqûb nizanibû ku jina wî vê yekê kiribû.



Şevêkê çaxê Aqûb li ser rê bû,
milyaketên Xwedê rastî wî hatin.

Ew hat bibiranîn ku Xwedê bi wî re
bû û navê wê derê Mahanayîm
an jî Du Wargeh danî.



Ka li pêşiya me biçin
û bi bira û xweyê min
Esawê re biaxavin.

Ji wî re bêjin ku ez li ba apê me Lavan
bûm û min gelek tişt bi dest xistin: ga, ker,
mî, xulam û xadim. Ez hêvî dikim
ku dilê wî bi min xweş be.



Piştî çend rojan...

Em çûn ba birayê te Esaw.
Va ye ew jî bi 400 zilamên
xwe re tê pêşiya te.

Ew yeka qet ne baş e... Ka werin
em xwe û pez, dewar û deveyên
xwe bikin du beş.



Heger birayê min were û
êrîşî beşekî bike, wê
beşê din bireve.



Sibê zû, keriyek bizinan bi xwe re
bibin, piştê mî, piştê deve, piştê
çêlek û piştê ker. Bila hûn jî
hev dûr bin.

Çaxê tu rastî Esaw werî, jê re bêje: "Ev
keriyên xulamê te Aqûb in û wan wek
diyarî ji xweyê xwe Esaw re
dişîne. Aqûb li pey me tê."

Aqûb hemû malê xwe derbasî Çemê
kir û ew jî bi tena serê xwe ma.



Aqûb bi mirovekî re heta ber destê sibê gulaş kir.

Gelek bawer dikin ku ev bûyer
serdaneke pêş-şikilgirtî ji Îsayê Mesîh e.



Li berbangê ew mirov li kemaxa Aqûb
xişt û heştîyê qorika wî jî cih derket.




Min berde ez herîm,
va ye roj hiltê.

Heta ku tu min pîroz
nekî, ez te bernadim.

Êdî wê ji te re "Aqûb" neyê
gotin, lê wê "Îsrâîl" bê gotin – Çimkî
te bi Xwedê û bi mirovan re
gulaş kir û tu bi ser ketî.

Û Aqûb jî rabû navê wê derê Peniyêl an Rûyê Xwedê
danî, çimkî ew Xwedê rû bi rû dît û dîsa jî ew sax ma.







Ev koma ku ez
lê raştî hatim tē
çi maneyê?

Me ji hev bi awayekî
nebaş veqetî, lê niha
ez dixwezim dilê te
bi min xweş be.



Birako, ez ne hewceyê wan
im -- Bi qasî ku tîra min
bikê malê min heye.

Nexêr! Dîtinê rûyê te wek
dîtinê rûyê Xwedê ye.

Divê tu diyariya
min qebûl bikî.



Heger wisa be, îcar ez ê wan
wek diyariyekê ji destên te
qebûl bikim.

De îcar divê em pêş
ve biçin. Ez ê li gel
we biçim.


Em nikarin.

Zarok hûr in û ji ber mî û çêlekên
şîr em ê hêdî hêdî bîn.



Wê çaxê bihêle ku
ez çend kes bi te
re bihêlim.

Çima? Tenê ez dixwazim
dilê xweyê min bi min
xweş be.



Li welatê Kenanê, Aqûb perçêkî zewî ji kurên Hamor kirî.

Rojekê dema ku Dînya keça Aqûb sardana jinên herêmê dikir, çavê wê bi Şexemê kurê Hamorê ket.

Wê anîn ba wî -- û wî jî bi zorê pê re raza û nizim kir.



Dîna, keça min, ew çî bû bi serê te?!



Dilê kurê min Şexem ketiye keça we û dixwaze ew bibe jina wî.

Wî wê qirêjkir!

Tiştê ku wî kir şerm e.



Lê dilê wî ketiye wê.

Ji kerema xwe... Di nav me de bijîn û bila em bibin merivên hev.



Nabe, em nikarin xwişka xwe bidin miroveki nesinetkirî.

Divê hemû mêrên we sinet bibin û bibin wek me.





Hamor û kurê wî Şexem qebûl kirin. Ew mêrên
bajêr razî kirin ku werin sinetkîrin da ku bi malbata
Aqûb re bibin meriv.



Piştî sê rojan birayên Dînayê, Şimon
û Lêwî, tola xwe ji wan girtin.

Dema ku tevahiya mêran êşa sinetbûnê dikişandin û saxdibûn,
ew ketin bajêr û hemû mêr tev Hamor û Şexem kuştin.

Herwiha ew tiştên
mayî talan kirin.

Ev çi ye ku we bi
serê me anî?!



Em hindik in û heger yên Kenanî û yên
Perîzzî bi hev re hêza xwe li dijî me bikin
wê malbata me bi tevahî were tunekirin.

Lê ew lawo xwişka me
wekê fahişekê hesaband.

Ew hêjayî ev
yeka bûn.



Bi rêberiya Xwedê Aqûb vegerî Bêt-Êlê ku Xwedê li wir li wî xuya bû piştî ew ji ber birayê xwe Esaw reviyabûyî bibû.

Divê em hemû Îlahên xerîb bavêjin û xwe li pêşiya Xwedê paqij bikin û cilên xwe biguherin.



Hemû yên ku bi Aqûb re bûn dev ji guharên xwe yên zêrî û pûlên xwe berdane Aqûb ew li şexemê veşartin û piştê ber bi Bêt-Êlê ve bar kirin û çûn.



Aqûb gorîgehek çêkir ku Xwedê ku xwe li wê derê nîşanî wî dabû biperizin -- û tirs û sawa ketin dilê miletên di derdora wan de û ji ber vê tu kes nêzîkê wan nebû û êrîşî wan jî nekir.



Wî navê wê dera ku Xwedê pê re peyivibû Bêt-Êl (yanî Mala Xwedê) danî.

Piştî wan ji Bêt-Êlê bar kirin,
Rahêlê destpê bi zarokanîne
kir û êşeke mezin kişand. Çaxê
kurê wê hate dinê wê xatirê ji
dinê xwaşt û mir.



Rahêlê navê wî Ben-Onî --
kurê kedera min -- danî.

Lê Aqûb navê wî Binyamîn --
kurê destê min ê rastê -- danî.



Piştî Aqûb vegeiya mal li
Kenanê, bavê wî Îshaq mir.

Kurên wî ew li şikefta ku dê û bavên
wî hatibûn veşartûn veşartin.




Esaw bû bavê
Edomîyan.

Peyva Edom ji
peyva "sor" ve tê.



Ne tenê porê Esaw sor bû, welatê
ku lê rûdinişt ji bi kevîrê şelakî
ya sor niximti bû.

Û Aqûb jî li Welatê Kenanê, ku
bavê wî li wir dima, rûnişt.





"THE BIBLE EXPLAINED
IN EVERY LANGUAGE."



SUPERBIBLE.TV